

TIER 2

Encumena Azadîya Dînî ya Navneteweyî ya DY (USCIRF), encûmeneke hikûmeta federal a DY-yê ya cotpartîyîyî ya azad e ku bi Qanûnê Azadîya Dînî ya Navneteweyî (IRFA)ya 1998ê sazîrî ye û çavdêrîya mafê azadîya dînî û bawerîyê ya cîhanî ya derveyê welêt dike. USCIRF ji bo çavdêrîya bînpêkirinên azadîya dînî û bawerîyê standardên navneteweyî bi kar tine û ji Serekê Dewletê re, Wezîrê Karên Derve re û Kongresê re pêşniyarîyên siyasî pêşkêş dike. USCIRF dezgeheke azad e ku ji Wezîrîya Karên Derve cuda tevdigere. Raporta 2019ê ya Çalakîyê bibelgêkirina bînpêkirinên li ser rûyê cîhanê û ji aliyê pêşniyarîyên siyasî yê azad ji bo hikûmeta DY ve karên salekê ya koma profesyonel û Endamên Encûmenê bi awayekî herî bilind eşkere dike. Raporta 2019ê ya Çalakîyê, dewra nava Çileyê Paşîn ê 2018ê heta Çileyê Pêşîn ê 2018ê dixê nava xwe, lê di hin rewşan de bûyerên giring ên piştî vê dewrê jî dixê nava xwe. Ji bo zanîna bêtir a li ser USCIRF-ê hûn dikarin ji [vê derê](#) serdana sîteya înternetê bikin yan bi rêya jimara 202-523-3240ê ya tîlefonê yekser xwe bigihîninê.

Tirkîye

Bidestketîyên Hîmî: Di 2018ê de li Tirkîyeyê rewşa azadîya dînî bi dijwarî bîteşqe le maye û endîşeyên ciddî peyda bûne ku dê berê rewşa heyî ya welêt sala pêş hê ber bi xerabtirbûnê ve biçê. Ji ber ku hikûmeta Tirk, ev demeke dirêj e ji bo çareserkirina teşqeleyên azadîya dînî hîç tevgerê pêk neanîbû, ev endîşe peyda bûbû. Çendîn sînorkirinên li ser azadîya dînî yan bawerîyê dewam kirine û gefê li hêza jîyana komên kêmanîyên dînî yê li welêt xwariye; ji bilî van, tevgerên dezgehên dewletê û çapemenîya nêzîkî hikûmetê yê şeytankirinê û kempeyna reşkirinê di nava komên kêmanîyên dînî de bûne egerê bêtirbûna rewşa tirsê. Hikûmeta Tirk, tevgera xwe ya destavêtina karên komên dînî dewam kiriye; ji hîlbijartina patrîkîya Dêra Apostolîk a Ermenîyan re destûr nedaye û şertê xwe yê wek ji bo ku metropolîtên Ortodoksên Rûm tevî Encûmena Dêra Pîroz bibin welatîyên Tirk bin, dewam kiriye. Bi hezaran kesên li ser rêça Fethullah Gulenê serwerê dînî, yê li DY dijî, bi îddîaya ku ew hevkarîya derba tîkçûyî ya Temûza 2016ê kirine yan tevî çalakîyên terorîst bûne her car ji dezgehên dewletê hatine avêtin, hatine binçavkirin û girtin. Hikûmeta Tirk, her kesê ku bi Gulenî tîkildar be, bîyî ferqê bixê nava wan, wek perçeyekî dezgeha terorîst bi nav kirine. Destûrdarên dewletê, ji bilî van, bi rêya vegotinên çapemenîyê û vegotinên platformên çapemenîya komelayetî, her car neyartîya Cihûyan kirine û rojnameyên alîgirên hikûmetê û endamên çapemenîyê hem li dijî Filehan û hem jî Cihûyan gotinên nefretê belav kirine. Dîgel ku dewlet, ji bo dezgeha dewletê ya bawerîya Îslamîyeta Sinnî bi rê ve dibe pêşniyarîya bêtirkirina budceyeke %36 kiriye -tevlî Elewîyên ku dewlet, ew ji dînekî bêtir wek kulturekê dibîne- komên din ên dînî, desteka pereyî ya wek hev bi dest naxin. Lêbelê ji ber tîgihîştina hişk a laîkbûnê ya Tirkîyeyê; -tevlî Mislîmanên Sinnî- tu komeke din a dînî nikare rewşeke hiqûqî bi temamî bi dest bixê. Di mijarên wek vegerandina milkên dînî yê dewletkirî û ji xwandinkarên xwandina pêşîn û navîn re bi zorê hînkirina dînî endîşeyên heyî ev demek e hê jî hene. A paşîn; proseya bi zordestî binçavkirin û dadgehkirina

Andrew Brunson-ê keşe, ya bêtirî du salan rû daye, ya ku li dijî Filehan bû egerê gotinên nefretê, piştî ku hikûmeta DY di Çîrîya Pêşîn a 2018ê de pê kir ser, bûyer, bi bêgunehdîtina Brunsonî û demildest serbesthiştina wî encam da. Şandeyeke USCIRF-ê di tarîxên Gulan û Temûza Çîrîya Pêşîn a 2018ê de li Elîaxaya Tirkîyeyê tevli rûniştinên dadgehê yê Brunson-ê Keşe bûye.

USCIRF, li ser van rewşan, ji ber ku Tirkîye di warê Qanûnê Azadîya Dînî yê Navneteweyî (IRFA) de di 2019ê de wek “welatê endîşedêr ê taybet” (CPC) binavkirî ye, ji ber ku yek ji hêmanên standardê “sîstematîk, her car, tirsnak” ji alîyê azadîya dînî yan ji ber çavgiirtina ji wê re careke din wê bînpê kiriye, wê di Asta 2yê de bi cîh dike. Lêbelê USCIRF, ji bo ku bixuyîne dê rewşa welêt a sala pêş bê guherandin yan neyê guherandin, dê çavdêrîya xwe ya li ser rewşa azadîya dînî dewam bike.

Pêşniyarîyên ji Hikûmeta DY re:

- Teşwîqkirina hikûmeta Tirkîyeyê ji bo bi temamî pêkanîna biryarên azadîya dînî û bawerîyê yê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê (ECtHR), wek ji mîkroçîpên kardên nasnameya neteweyî derxistina cîhê endamîya dînî û naskirina cîhên perestina malên kombûna Elewîyan wek cîhên perestîna yê qanûnî naskirina pîrên Elewîyan wek serekên dînî;
- Zorê bide hikûmeta Tirk ku ew tedbîrên ji bo keysa serdana destekên pereyî yê dewletê yê ji bo destekkirina xwedîkirin û nûkirin û avakirina cîhên perestina komên Mislîmanên ne Sinnî;
- Teşwîqkirina hikûmeta Tirk ji bo pêkanîna çarçoveya bernameyê hînkirinê ku ew hemû komên dînî yê li Tirkîyeyê bixe nava xwe û wek ku ECtHR şert danîye, bêyî ku xwandîkar ramanên xwe yê dînî û felsefî bidin der, destûrdayîna azadbûna ji dersên dînî;
- Pêkirina ser hikûmeta Tirkîyeyê ji bo pêkanîna sozên xwe yê taybet û tevahî yê ji bo jinûvevekirina Xwandîngeha Keşeyên Rûmên Ortodoks û destûrdayîna bêyî destwerdana dewletê, hîlbijartinên Dêra apostolîk a Ermenîyan ji bo patîrîkîyê; û
- Pêkirina ser hikûmeta Tirk ku ew dev ji danzanînên dij-Cihû ber bide û destûrdarên dewletê yê komên dînî yê li Tirkîyeyê piçûk dixînin eşkere tawanbar bike.

Serbuhurî

Tirkîye

Navê Temamî: Komara Tirkîyeyê

Hikûmet: Komara Biserek

Nifûs: 81.257.239

Dîn/Bawerîyên Hikûmetê ew Nas Kirine: Îslam, Apostolîkên Ermenî, Ortodoksên Rûm û Cihûtî (sisê ji wan kêmanîyên bi Lihevkirina Aştîyê ya Lozanê naskirî ne)

Demografîya Dînî *:

%99,8 Mislîman (pirranîya wan Sinnî ne lê li gora bawerîyan ji 10 heta 25 milyonan Elewî)

%0,2% yên din, tevî Apostolîkên Ermenî, Bahaî, Ortodoksên Bûlzar, Katolîkên Keldanî, Ortodoksên Rûm, Şahidên Yehovayî, Cihû, Protestan, Katolîkên roman, Katolîkên Suryanî û Ortodoksên Suryanî

*Texmîn ji Pirtûka Rastîyên Dinyayê yên CIA-ê û ji Wezîrîya Derve ya DY hatine sitandin

Li Tirkîyeyê rewşa mafên mirovan û azadîyên hevvelatîyan, piştî raperikîna li dijî tevgera derbeya têkçûyî ya Temûza 2016ê hinbihin xerabtir bûye. Di nav du salên piştî tevgera derbeyê de, hikûmeta Tirk bi îddîayên bi tevgera derbeyê ve girêdayî û girêdana bi terorê ve, bêtirî 150.000 karkirên dewletê ji karî avêtiye bi dehhezaran kesan binçav kiriye û girtiye û li gora Encûmena Parastina Rojnamegeran; 68 rojnamegeran ji ber karên wan girtiye, ku ev, di 2018ê de jimara herî pirr a rojnamegerên girtî yên li her çî welatekî ye. Hikûmet, ji bilî van, bêtirî 150 dezgehên çapemenîyê girtine û pirranîya çapemenîya azad a li welêt hinbihin ketiye destê dezgehên alîgirên hikûmetê. Receb Teyîb Erdoxanê Serekdewlet di Hezîrana 2018ê de di proseya pêkanîna destûrdarîya birêvebirîya firehkirî ya di çarçoveya sîstema nû ya serektiyê ya bi giştîpirsîya Nîsana 2017ê de erêkirî de, bi bijartinên serekdewletîyê û parlemanê yên berî demê dîsa hatiye bijartin.

Digel biryara ECtHR di Çirîya Pêşîn a 2018ê de binçavkirina berî dadgehkirina Selehedîn Demîrtaşê serekê kevn ê Partîya Demokratîk a Gelan (HDP) a dijber nerewa dîtiye û gotiye divê bê serbestkirin jî, hikûmet, hê jî Demîrtaşê binçavkirî wisa hiştiye. Di Temûza 2018ê de li Tirkîyeyê 18 serek û nûnerên dînî yên ji komên Fileh û Cihûyan, bi danzanîneke hevpar îddîa kirine ku zordestî li wan tê kirin û ev rewş bûye sebebê gumana ku dibe ku ev danzanîn bi hevkarîya hikûmeta Tirk yan ji alîyê hikûmetê ve hatibe destpêkirin.

Hema hema %99,8ê nifûsa Tirkîyeyê Mislîman e û pirranîya wan xwe wek Mislîmanên Sinnî bi nav dikin. Li gora hinek texmînan, hin ji Elewîyên ku nifûsa wan di nava 10 milyon û 25 milyon de ne, digel ku xwe wek kultureke xweser a ne Mislîman bi nav dikin jî, hikûmeta Tirk ew wek Mislîman qebûl dike. Kêmanîyên nemislîman ên dînî li Tirkîyeyê kêmtirî %0,2yê nifûsa tevahî ne ku ew; Apostolîkên Ermenî, Bahaî, Ortodoksên Bûlzar, Katolîkên Keldanî, Ortodoksên Rûm, Şahidên Yehovayî, Cihû, Protestan, Katolîkên Roman, Katolîkên Suryanî û Ortodoksên Suryanî ne.

Di 1982yê de destûra bingehîn a Tirk, azadiya bawerî û perestîna û azadiya belavkirina bi taybetî ramanên dînî nas kiriye û cudakarîya ji ber egerên dînî jî qedexe kiriye. Digel vî awayî jî, pêkanîna laîkîyê ya hikûmetê; bi awayê kontrolkirina dewletê ya komên dînî û perestîngihan e. Hiç dînek bi temamî ne xwedîyê meqamekî hiqûqî ye. Serektîya Karên Dîyanetê li Tirkîyeyê pêkanîna Îslamê di kontrola xwe de dihêle lê hemû dînên din, di binê sîwana Birêvebirîya Tevahî ya Weqfan de ne.

Rewşa Azadiya Dînî ya 2018ê

Hînkari: Di 2018ê de digel ku di xwandingehên dewleta Tirk de bernameyeke nû ya hînkirinê hatiye pêkanîn jî, “Dersa Kultura Dînî û Zanîna Exlaqê” li xwandingehên asta pêşîn û navîn hê jî bizorê ye. Wek ‘adet, ji komên Lihevkirina Lozanê re (Apostolîkên Ermenî, Ortodoksên Rûm û Cihû) destûr hatiye dayîn ku ew ji vê dersa li ser Îslamê disekine bêrî bin. Di sala çûyî de Xwedênenas jî bêrî bûne. Lê digel biryara ECtHR-ê ya di 2014ê de ku divê ev ders mecbûrî nînbe û xwandîkar ne mecbûr bin nasnameyên xwe yê dînî eşkere bikin jî, tevî Elewîyan, ji endamên hin bawerîyan re keysa vê cudakarîyê nayê dayîn. Xwandîkarên ku bêrîbûnê dixwazin û xwedîyên wan gelekê caran proseyeke dirêj a arzîhalê didin destpêkirin, yan jî dozê vedikin; lêbelê eger ku dadgeh ji wan re bikeve jî, ev biryar ji alîyê xwandingehê ve her car nayê pêkanîn.

Destwerdana Dewletê ya Karên Komên Dînî: Hikûmeta Tirk di 2018ê de hê jî dest avêtiye karên hundirê komên dînî û nexasim jî mafê hîlbijartina serekên koman bixwe. Ji ber şertê dewletê yê wek ku divê endamên Encûmena Dêra Pîroz welatîyên Tirkîyeyê bin, hunera xuyandina endaman a ji bo vê meclisa ku patrîkê vê komê hildibijêre tê sînorkirin. Digel ku Tirkîye ji cotwelatîbûna patrîkên biyanî re erê kiriye jî, şertê navbuhurî ji bo koma Ortodoksên Rûm barekî beredayî ye û bi çavê awayekî destdanîna ser encamên hîlbijartinên pêşdemê lê hatiye nihêrtin.

Dêra Apostolîk a Ermenîyan a ku Mesrob Mûtafyanê serekê wê yê rûhanî piştî raporkirinê di Adara 2019ê de mir, ji ber biryareke Wezîrtîya Derve ya nahêle ji destpêka sala 2010ê ve hîlbijartin bên pêkanîn, nikare hîlbijartinên patrîkîyê bike. Kom, piştî ku di Adara 2017ê de dest bi proseyeke hîlbijartinê kir, Walîtîya Stenbolê dest avêt hîlbijartinan û ew wek “ji alîyê qanûnî ve bêkeys” bi nav kir û îddîa kir ku ew ê “di civatê de bibe sebebê cudabûnê”. Walîtîya Stenbolê di Sebata 2018ê de ji Patrîkxaneyê Ermenîyan re nameyekê şand û bi wa da zanîn ku mercên egerên hîlbijartinê hê bi cîh nehatine û bi vî awayî nehişt hîlbijartin pêk werin.

Kardên Nasnameya Neteweyî: Endîşeyên wek ku mîkroçîpên di kardên nasnameya neteweyî de zanyarîya li ser nasnameya dînî ya xwedîyê kardî di xwe de dihêle û ev awa jî dibe sebebê karîna xwandîna mîkroçîpan û ew li cîhên karkirinê û cîhên din dikarin bibin sebebê cudakarîyê, hê dewam dikin. Ku hikûmet di Sebata 2018ê de tomarên nûfûsê vekir û destûra xwegihandina

zanyarîyên azbatê da, ev awa bû sebebê endîşeya ku kêmanîyên dînî yê wê Ermenîyan, Rûman û Cihûyan bi tevgereke bi hikûmetê re têkildar bîn fişkirin. Her çend vekirina tomarên nifûsê wê gaveke erênî ya ber bi erêkirina ji bo cûrbicûrbûyîna nîjadî û dînî ya Tirkîyeyê hatibe qebûl kirin jî, hin kes ditirsin ku ev zanyarî bi mebesta bikaranîna cudakarîyê û reşkirinê bîn bikaranîn.

Elewî: Elewî, kêmanîya dînî ya herî mezin a Tirkîyeyê ne. Lêbelê hikûmet ev demeke dirêj e Elewîyan wê Misliman dabeş dike û wan ji Mislimanên Sinnî wê komeke dînî ya cuda nas nekiriye. Digel biryareke ji aliyê ECtHR-ê ve di Sebata 2015ê de weşandî, hikûmet, hê jî ji bo ji dersên dînî yê bizorê yê li ser têgihîştina Îslama Sinnî, gavên azadbûna xwandinkarên Elewî neavêtine. Serekên Elewîyan ji bilî van, ji bo ramana bernameya ku perestîngê Elewîyan wê cîhekî “pêkanîna rîtuêl û ‘adetên’ binavkiriye re, erê nekiriye.

Dadgeha Temyîzê ya Bilind di 2018ê de ji bo têkoşîna demdirêja a Elewîyan biryareke erênî dîyar kir ku “cîhên kombûna” (cemevî) elewîyan wê cîhên fermî yê perestîne bîn qebûl kirin. ECtHR di Nîsana 2015ê de biryar dabû ku Tirkîye bi nasnekirina cîhên perestîna Elewîyan, ji wan re nedayîna statuya fermî û cudahiştina wan a wê serbesthiştina wan a ji fatoreyên elektrîkê, mafên Elewîyan bînpê kiriye. Dadgeh bi vê biryarê biryar da ku malên kombûnê (cemevî) cîhê perestîne ne û hikûmet, her wê ku li mizgeftan û cîhên din ên perestîne çawa be, divê fatoreyên elektrîkê yê malên kombûnê jî bide. Di paşîya dewra raporkirinê de ev biryar hê teqez nebûbû û hê ne dîyar bû ka dê biryar di tevahîya welêt de di statuya malên kombûnê de tu guherînekê bike yan na.

Dij-Cihûtî: Di çapemenîya çapkîrî û ya komelayetî ya alîgira hikûmetê de neyartîya Cihûyan dewam kiriye. Li gora raporteke Weqfa Xrant Dînkî ya ku dezgeheke komela sivîl a herêmî ye, li ser vegotinên nefretê de, di nava Çileyê Paşîn û Nîsana 2018ê de 427 vegotinên ku Cihû bi taybetî ji xwe re kirine mebst rû dane. Di xeberan û manşetan de bi mebesta dewleta Cihûyan bal hatiye kişandin ser Cihûyan û di xeberên çapemenîyê yê li ser rewşa têkilîyên Tirkan-Îsraîlê de Cihû hatine xuyandin.

Siyasetmedarên Tirk jî herweha li dijî Cihûyan vegotîne. Di Tebaxa 2018ê de Bûrhan Kûzûyê endamê sazkar ê Partîya Edaletê û Geşepêdanê (AKP) û wekîlmilletê kevn, di twêteke xwe ya avêtî de îddîa kiriye ku malbatên Cihû pere çap dikin û “dinyayê bi rê ve dibin” û Abraham Lîncoln û John F. Kennedy “ji aliyê Sîyonîstan ve hatine kuştin”. Tevlî ku ev awa bi partîya desthilatdar a retorîk re heye, di dijberan de jî rû daye. Di Tebaxa 2018ê de Mûherrem Înceyê namzetê Partîya Komarê ya Gelî (CHP) yê serekîyê rexne li Erdoxanê serek girtiye ku ew çima xelateke wêrekîyê ya Cihûyan a ji bo şerefa dîplomatekî Tirk î ku malbatên Cihû ji tovkujiyê azad kiriye wergirtiye, Înce, bi vegotinên li dijî Cihûyan hatiye gunehbarkirin.

Protestan: Koma Protestanan hê jî bûye mebesta vegotinên nefretê, xasma Filehên Evanjelîk bi Brunson-ê Keşe ve hatine girêdayîn û hatine şeytanîkirin. Hatiye danzanîn ku bi kêmayî 20 malbatên Protestan ên biyanî hatine dersînorkirin yan bi rêya redkirina nûkirina vîzeyê zor li wan hatiye kirin ew ji Tirkîyeyê derkevin.

Brunson-ê Keşe yê welatîyê DY ku di seranserê 23 salan de li Îzmîra Tirkîyeyê dijîya û komeke piçûk î Protestanan bi rê ve dibir, di Çîrîya Pêşîn a 2016ê de piştî ku destûrdarên Tirk ew bi zordestî binçav kirin, di zîndanê de bêtirî du salan maye. Destûrdar di serî de Brunson-ê Keşe bi endamîya dezgeheke terorî gunehbar kirine, di Adara 2018ê de jî wî bi “tevlî neendambûnê li ser navê dezgeheke terorê sûckirinê” û “bi mebesta sîxurîya siyasî yan eskerî bidestxistina zanînen veşartî yên dewletê” gunehbar kirine. Brunson-ê keşe di vî warî de hem bi destekdayîna Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) û hem jî bi ya Dezgeha Terorê ya Fethullahçî hatiye gunehbarkirin û hatiye îddîakirin ku ew xwastiye welêt perçe bike û nifûsa nîjada Kurd a Tirkîyeyê bike Fileh û bi vî awayî dewleteke Kurdistanê ya azad ava bike. Jêdera hîmî ya zanyarîyên gunehbarkirinê şahidekî veşartî bû. Digel ku Erdoxanê Serek îddîa kiriye ku biryara paşîn, a sîstema dadgehî ya Tirkîyeyê ye û ji daxwazên berdana Brunson-ê Keşe û vegerandina wî re car caran bi dijwarî erê nekiriye jî, di Îlona 2017ê de gotiye di gerewa vegerandina Gulenî de ew kar in Brunson-ê Keşe teslîm bikin û bi vî awayî gotinên wî hev û din negirtine.

USCIRF, berî azadkirina Brunson-ê Keşe, wek perçeyekî ku [Proceka Zîndanîyên Wicdanî yên Dînî](#) ya ku Encûmen wê bi rê ve dibe, li ser navê wî çalakîya parastinê pêk anîye. USCIRF, dema ku Brunson-ê Keşe di Zînda Kiriklarê de girtî bû, di Çîrîya Pêşîn a 2017ê de çûye serdana wî (şandeya pêşîn a ji bilî malbatê û balyozîyê ku ew dîtiye) û tevlî sê rûniştinên dadgehî yên Gulana, Temûza, Çîrîya Pêşîn a tarîxên 2018ê bûye.

Dadgeheke Tirk, Di 12ê Çîrîya Pêşîn a 2018ê de Brunson-ê Keşe bi alîkarîya dezgeheke terorî gunehbar kir û wî bi 3 sal û mehek û 15 rojên cezayê zîndanê ceza kir û dozger biryar da ku dema zîndanîbûnê tamam bûye. Di heman rojê de Keşe ji zîndanîkirina malê hat azadkirin û destûra vegera DY hat dayînê. Digel ku serbesthiştina Brunson-ê Keşe wek bipêşveçûneke gelek baş hat dîtin jî, balkêş e ku ev awa piştî ku meqamên herî bilind ên DY bi awayekî dijwar pê kirin ser Tirkîyeyê rû da. Ji alîyê dadgeha Tirk ve bi destekdayîna dezgeheke terorê cezabirîna lê jî, ji bilî dewamkirina zordestîya lê bi kêrî tu tişteki din nehat.

ECtHR piştî dewra raportkirinê, di Çileyê Paşîn ê 2019ê de, bi biryareke ji bo alîgirîya Weqfa Adventîstên Roja Heftan biryar daye ku Tirkîye bi destûrnedayîna tomara weqfê, mafê kombûna endamên dêrê bînpê kiriye. Tirkîye, bi mebesta ku ‘ji bo xizmetkirina bi tenê komekê weqfek nikare bê avakirin’, tomara weqfê qedexe kiribû.

Kêmanîyên din ên Fileh: Şahidên Yehovayî hê jî nikaribûne li dijî xizmeta eskerîyê mafê xwe yê redda wicdanî bi dest bixin û ji ber ku bawerîyên xwe jîyane bi lêpîrsînê, sizakirina pereyî û

sizakirina zîndanîbûnê rûbirû mane. Di 2018ê de li 66 Şahidên Yehovayî hatiye vepirsîn. Ji ber ku hikûmet ew demeke dirêj bû pê kiribû ser karsazan, çendîn Şahidên Yehovayî bi egera ji çûyîna eskerîyê re erê nekiribûn, karên xwe ji dest didin.

Di Nîsana 2018ê de Dêra Ezîzên Dema Paşîn a Îsa Mesîhî li welêt ji ber “dewra tengijîna siyasî ya demdirêj a dewamkirî” li hin cîhên din kar daye dilxwazên xwe yên li Tirkîyeyê. Di gunehbarkirinên li dijî Brunson-ê Keşe de, piştî gunehbarkirina endaman a bi tevgera sîxurîya li welêt a di bin cilika mîsyonerîyê de di seranserê sala 2018ê de ev dêr û endamên wê di endamên çapemenîya alîgira hikûmetê de hatine reşkirin.

Mislimanên Sinnî: Kesên li ser rêça Gulenê serwerê dînî yê li DY dijî ji alîyê hikûmetê ve bi zordarîya hinbihin bêtirbûyî rûbirû mane. Piştî tevgera têkçûyî ya derbeyê ya 2016ê, di nava du salan de, hikûmeta Tirk, têkildarên bi Gulenî re ji xwe paqij kirine, di encama vî awayî de bi dehhezaran kes ji kar hatine avêtin, hatine binçavkirin û girtin. Hikûmet hê jî gotiye Gulen û alîgirên wî ji bo pelîşandinê hikûmetê komployekê saz kirine lêbelê bi tenê kêmanîyeke pîrr piçûk bi tevlîbûna tevgera derbeyê hatiye gunehbarkirin. Hikûmet, di Gulana 2016ê de Gulen û alîgirên wî wek Dezgeha Terorê ya Fetullahçî (FETO) bi nav kiriye.

Milkên Kêmanîyên Dînî: Kêmanîyên dînî hê jî vegerandina milkên ji alîyê hikûmetê ve dewletîkirî xwastine. Patrîkxaneyê Ermenîyan dixwaze ku Sansaryan Xana ku berê ji bo hînkirina zarokên Ermenî bi kar dihat li wan were vegeandin. Weqfa Ortodoksên Rûm a Bozcaadayê jî digel biryara Birêvebirîya Tevahîya Weqfan a ji bo dewrkirina tapoyan a Îlona 2014ê jî, hê jî nikaribûye tapoyê 11 milkan wergire.

Xwandingeha Rûhbanên Ortodoksên Rûm a Heybelîadayê ji dema girtina wê ya 1971ê ve nikare hînkirina dînî pêşkêş bike. Dewleta Tirk bi biryareke destûra bingeîn a ji bo qedexekirina dezgehên taybet ên bilind ên hînkirinê, û a rastî ew bixwe ji bo bi zorê girtina xwandingehên teologîk û dînî ye, vê xwandingeha rûhbanîyê girtiye. Digel ku dewleta Tirk û destûrdarên wê car caran gotine ew dixwazin xwandingeh ji nû ve bê vekirin jî, hîç gaveke xuyayî neavêtine. Di Nîsana 2018ê de Dîmîtrî Bartalemewoyê Patrîkê Ortodoksên Rûm ji bo ji nû ve vekirina xwandingeha rûhbanîyê, ew û Erdoxanê Serek hatine rû hev. Çapemenîya Tirk gotiye dê Erdoxanê Serek guh bide ji nû ve vekirina xwandingeha rûhbanîyê, Bartalamewoyê Patrîk hîvî dike ku xwandingeh di dewra Îlona 2018ê ya hînbûn û hînkarîyê de dîsa vebe; di dewra paşîn a raportkirinê de xwandingeh hê jî girtî ye.

Di Çileyê Paşîn ê 2018ê de Erdoxanê Serekdewlet û Boyko Borîsovê Serekwezîrê Bulxaristanê li Stenbolê tevlî merasima vebûna Dêra Ortodoksên Bûlzar a Ezîz Stephen-î ya nûkirina wê di 7 salan ajotîne, bûne. Pereyê vê nûkirinê hem ji alîyê hikûmeta Tirk û hem a Bûlzar ve bi hev re hatiye dayîn û li ser hîmê erka dualîtîyê dewleta Bûlzar jî li bajarê Fîlîbeya Bûlzaristanê destûra nûkirina mizgeftêkê daye. Piştî lihevnekirineke hiqûqî ya demdirêj a ku reformên axên dezgehên

bajarvanîyê di 2008ê de bûne sebebê wê, di Gulana 2018ê de dewlet, di serî de Manastira Mor Gabriêlî jî di nav wan de, tapoyê 50 milkan li Dêra Ortodoksên Suryanî ya Mêrdînê ve gerindiye. Li gora Hakan Çavûşoxlûyê Alîkarê Serekwezîrî, destdanîna ser milkên Ortodoksên Suryanî û pêşî dayîna wan a ji gencîneyê re û paşê jî ji Dîyanetê re, ji ber “jihevfehmkirineke şaş” bû, lêbelê destûrdarên dînî vê tevgerê wek êrîşeke bizanîn a li dijî Dêra Ortodoksên Suryanî fehm kirine. Di Temûza 2018ê de Birêvebirîya Tevahîya Weqfan hin gavên erênî avêtine ku hin milkên dînî bêyî tu têçûyînekê, dewrî weqfên têkildar bîn kirin, wek Dêra Sacre Coeur-ê bê dayîn Dêra Katolîk a Suryanîyan, û Dêra Mar Yûhannaya Hatayê bê dayîn Weqfa Ortodoksên Rûman. A paşîn, di Çileyê Paşînê 2019ê de destûrdarên herêma Stenbolê piştî çendîn têkoşînên bi salan ajotî, di tarîxa Komara Tirkîyeyê de, ji bo avakirina dêra pêşîn destûrê dane. Digel ku ew awa piştî danzanîna ku ew ê li ser axa goristana berê ya Dêra Katolîkên Romanan bûye jî, qayîşkêşanên sal ajotine derketine.

Ayasofya: Ayasofyaya kevnare ya ku bazîlkayeye Ortodoksên Rûm e, û di sedsala 15an de bûye mizgeft, ji sala 1935ê ve wek muzexaneyek bûye xwedanstatuyeye hiqûqî. Lêbelê hin Misliman hê jî dixwazin ew dîsa bibe mizgeft û lê bê perestin. Di Îlona 2018ê de piştî ku komeleyeke taybet serî lê dane ku muzexane bibe mizgeft, Dadgeha Qanûnê Esasî ya Komara Tirkîyeyê daye zanîn ku komeleyek; wek kes nikare serî lê bide û bi egerên teknîkî ji vê daxwazê re erê nekiriye. Dadgeh daxwazê nirxandiye. Di Adara 2018ê de dema ku Erdoxanê Serekdewlek bi egerê destpêkirina zêweke hunerî li Ayasofyayê bûye, li dijî ku hikûmeta Tirk ji ber “bi mebestên dînî bikaranîna” muzexaneyê protesto rû dane. Di 2yê Adara 2019ê de piştî dewra raportkirinê, Erdoxanê Serekdewlek wek salên berê vegotineke tevgera wê bêencam ducarî kiriye û gotiye dê Ayasofya dîsa bibe mizgeft.

Jin û Azadiya Dînî: Di Çileyê Paşîn ê 2018ê de Dîyanet, di ferhengeke dînî ya rûpela xwe ya înternetê de xuyandiye ku li gora hiqûqa Îslamê qîzên 9 salî û kurên 12 salî dikarin bizewicin (li Tirkîyeyê ji bo zewacê temenê qanûnî 18 e lê bi erêkirina dê û bavên îstîsnayên zewaca di 17 salan de jî heye). Li ser raperkên gelfî, Dîyanet gotiye ew ji zewaca zarokan re erê nekiriye, gotiye her car temenê herî kêrî ew ji bo zewacê wê destek dikin; ji bo keçan 17, ji bo kuran jî 18 e. Di xebereke çapemenîyê ya tarîxa Çileyê Paşîn ê 2018ê de tê gotin ku di serê sala 2017ê de li nexweşxaneyeye Stenbolê 115 qîzên negihîştî ji ber ducanîbûnê tîr dermankirin. Li gora tomarên nexweşxaneyê, 38 ji wan qîzan berê 15 salan bûne ducanî.

Siyaseta DY

Tirkîye nîvekareke strategîk a Dewletên Yekbûyî, endameke Dezgeha Lihevkirina Bakurê Atlantîkê (NATO) û li Încîrlîkê xwedîya biryargeheke asîmanî ya Emerîkan e. Digel vê yekê, di seranserê salê de bi pirranî ji ber Brunson-ê Keşe yê welatîyê DY û Serkan Golgeyê zanyarekî Dayreya DY ya Asîmanîya Neteweyî û Fezayê (NASA) yê bi beşdarbûna derbeyê hatiye gunehbarkirin û tevî van, girtîmayîna sê welatîyên Tirk ên di balyozxaneyên DY de kar dikirin,

têkilîyên her du dewletan tengijîne. [Donald J. Trumpê Serek](#), Michael R. Pence-ê Alîkarê Serekî, Michael R. Pompeo-yê Wezîrê Karên Derve û hin endamên kongresê ji bû azadkirina Brunson-ê Keşe her car bang kirine. Wezîrîya Gencîneya DY di Tebaxa 2018ê de li ser Ebdulhemîd Gulê Wezîrê Edaletê yê Tirkîyeyê û Suleyman Soylûyê Wezîrê Karên Hundirî yê Tirkîyeyê, ji ber tevlîbûna sûcê girtina Brunsonê Keşe [pêdankirinê pêk anîye](#). Di heman mehê de Trumpê Serek vegotiye ku ew baca polaya û bafûna ji Tirkîyeyê bê sitandin duqatî kiriye, ev awa kiriye ku bihaya lîreyê Tirk gelek ketiye û di aborîya Tirkîyeyê de pêlên şaşomaşobûnê peyda bûne. Ji berdana Brunson-ê Keşe ya di Çîrîya Pêşîn a 2018ê ve têkilî hinek çêtir bûne. Di Çîrîya Pêşîn a 2018ê de pêdankirinên ser Gul û Soylûyê wezîr hatine rakirin.

Tevlî van girtinên li jorê xuyandî, endîşeyên bi daxwaza Tirkîyeyê ya kirîna sîstema fuzeyên S-400 ên Ûris ên bi sîstemên NATO-yê naguncin têkildar in hê jî hene û ev awa di Tebaxa 2018ê de li Kongresa Emerîkan bûye sebebê biryara ji Tirkîyeyê re bi awayekî demkî rawestandina firotina jetên F-35. Hikûmeta Tirkîyeyê ji bilî van, dijberîya desteka DY ya ku ew li Sûrîyeyê ji bo komên Kurd ên bi Dewleta Îslamî ya Îraq û Sûrîyeyê (DAÎŞ) re şer dikin dike; ji van koman, Yekîneyên Parastina Gel (YGG) a sereke ji aliyê Tirkîyeyê ve wek dezgeheke terorî ya bi PKKê re têkildar tê dîtin. Dewletên Yekbûyî ji 1997ê ve PKKê wek dezgeheke terorê [bi nav dike](#) lê YPGê bi vî awayî bi nav nekiriye. Ji bilî van, destûrdarên Tirk, bi îddîaya ku pêçîya wan di tevgera têkçûyî ya derbeyê de hebûye, hê jî pê dikin serê ku Gulen û têkildarên wî bîn vegeandin.

Dewletên Yekbûyî ji 2011ê ve bi rêya Komsêrîya Bilind a Bextxwazan a NY ya ku dezgeheke bextxwazan a Neteweyên Yekbûyî ye, alîkarîya pereyî dide bextxwazên Tirkîyeyê. Tirkîye xwedîtîyê li 3,6 mîlyon bextxwazên Sûrîyeyê dike ku ew ji bo xweparastina ji rejîma Beşşar Esedî û êrîşên DAÎŞê revîyane Tirkîyeyê ku ew xwedanbawerîyên cuda yên dînî ne.